| vîlik li dar xistin | oyun tezgahlamak | ourdir une intrigue | to hatch a plot |
| W | | | |
| were û vî kerî di vî bihurî re derbas bike | gel de bu işin içinden çık | (litt.) viens faire passer cet âne sur ce gué : comment se sortir de cette passe difficile | (litt.)easier to get this donkey over this ford, how can we get over this difficulty |
| warê xwe genî kirin | beceriksizliğinden dolayı kendi işini bozmak | nuire à ses intérêts par son incapacité | to harm one's interests by one's incompetence |
| wezna wê hatin | yeri ve zamanı gelmek | arriver à point nommé | just at the right moment |
| X | | | |
| xelkê tir kir toq ket sitûyê me | başkasının suçunun ceremesini çekmek | payer pour les fautes d'autrui | to pay for s.o. else's mistakes |
| xezeb di çavan de bûn | gözünü kan bürümek | voir rouge | to see red |
| xiyarê mişarekê | aynı türden olmak | être de la même engeance | to be of the same gang |
| xura xwe bi destê xwe şikêrandin: | göbeğini kendi eliyle kesmek | régler soi-même ses problèmes | to solve problems oneself |
| xura xwe bi destê xwe xurandin | kaşınmak | démanger, avoir des démangeaisons | to itch |
| xwê û sabûn jê hatin xwastin | evin geçimi ile ilgili sorumluluk sahibi olmak | être en charge de la subsistance d'une famille | to take charge of the expenditure of a family |
| xwe bera çolê dan | ayıp yerleri meydana çıkarmak | avoir les couilles en l'air | to expose oneself |
| xwe berdan | kendini koyvermek | se laisser aller | to let oneself go |
| xwe di kerî de bihartin | duymazlığa vurup geçiştirmek | faire la sourde oreille | to turn a deaf ear |
| xwe qoçandin ser hev (xwe diqoçîne ser hev) | büklüm büklüm olmak | se recroqueviller | to curl oneself up |
| xwe dîtin | kendini beğenmek | avoir une haute opinion de soi, prendre des airs | to have a high opinion of o.s., to put on airs |
| xwe şidandin | sıkı sarılmak; giyinip kuşanmak | s'attacher, se vêtir | to button o.s. up, to dress o.s. |
| xwe şuhurandin | açık saçık giyinmek | avoir une tenue légère | to be lightly or frivolously dressed |
| xwe girtin | 1) kendine hakim olmak; 2) maddi açıdan toparlanıp güçlenmek | 1) se retenir, se maîtriser ; 2) faire fortune, prospérer | 1) to control oneself; 2) to make a fortune, to prosper |
| xwe jê şuştin | kendini temize çıkarmak | se blanchir, se déculpabiliser, se disculper | to whitewash oneself, to remove guilt feelings |
| xwe jê bêrî kirin | sahip çıkmamak, ilişkinini kesmek; kendini muaf tutmak | s'innocenter, se tenir en dehors de qch. | to prove oneself innocent, to keep out of s.thg |
| xwe ji hev bêrî kirin | birbirine sahip çıkmamak, birbiri ile ilişkinini kesmek | s'ignorer, couper les relations réciproques | to ignore one another, to break off mutual relations |
| xwe jê re danîn: xwe jê re nizim kirin | taviz vermek, boyun eğmek | se soumettre, se plier devant qqn. | to submit, to bow down to s.o. |
| xwe li ba kirin | sallana sallana yürümek | marcher en se dandinant | to waddle |
| xwe li ber baranê şil kirin | kendi kendine gelin güvey olmak | faire son cinéma, prendre ses désirs pour des réalités | to put on an act, to take wishes for realities |
| xwe li ber nexistin | anlamazlıktan gelmek | feindre, faire semblant | to feign, to pretend |
| xwe li ber xweş kirin | hevesle hazırlanmak | faire les yeux doux, convoiter | to make eyes at s.o., to desire |
| xwe tê derxistin | girişmek, yapmaya cesaret etmek | entreprendre, oser faire | to undertake, to dare to do |
| xwe li ser hev guvaştin | havasını atmak | prendre des airs | to put on airs |
| xwe xistin êgir | kendini ateşe atmak | se jeter au feu | to jump in a deepend |
| xwe xwarin | kendini yiyip bitirmek | s'épuiser en reproche, se consumer | to wear oneself out with self reproach |
| xwe lê rast kirin: xwe lê qelibandin | üstünkörü girişmek | entreprendre à l'aveuglette | to undertake s.th. in the dark |
| xwe lê danîn | tenezzül etmek; çatmak | reconnaître, être condescendant | to recognise, to be condescending |
| xwe lê dan | girişmek | entreprendre, se coltiner avec | to undertake s.thg., to get landed with s.thg. |
| xwe li ber danîn | beklemek; gözetlemek | attendre, observer | to await, to observe |
| xweş kirin | cilalamak; bir şeyi olduğundan farklı biçimde ballandırarak anlatmak | embellir, enjoliver | to beautify, to brighten up |
| xwelî li serî! | toprak başa! | (litt.) que la terre tombe sur sa tête; pauvre de toi, misérable | (litt.) may earth fall on your head, you unfortunate miserable one |
| xwelîser | toprak başına, zavallı | pauvre de toi, misérable | you unfortunate miserable one |
| xweziya mirov bi dilê yekî bûn | birine imrenmek | envier qqn. | to envie s.o. |
| Y | | | |
| yeka wî nabe dudu | iki yakası bir araya gelmiyor | il tire le diable par la queue | he has difficulty making ends meet |
| yek nekir dudu | itiraz etmeden yaptı | accepter ou faire sans contester | to accept or do s.thg. without protesting |
| yekmal çûn | atlamamak; acele etmemek | aller doucement, faire gaffe | easy does it, be careful |
| yekta nebûn û duta tê re nebûn (yekta nabe û duta tê re nabe) | doluya koydum almadı boşa koydum dolmadı | ne pas réussi qch. quoi qu'on fasse, ne pas s'en sortir | failing at s.thg. whatever one does, having no way out |
| Z | | | |
| zar û ziman tune | ağzı var dili yok | être sans défense, incapable de riposter | being defenceless, unable to ripost |
| zêdaya ser kezebê | cabası | la cerise sur le gâteau | the icing on the cake |
| zerhimî bûn: zermihî bûn | sararıp solmak | pâler | to turn pale |
| zik li yekê werimandin: zik tije kirin: avis kirin | karnını şişirmek, gebe bırakmak | 1) engrosser; 2) excéder | 1) to get some one pregnant; 2) to exceed |
| zik li xwe kirin tipilk | karnını davul gibi şişirmek | se goinfrer, se remplir la panse | to stuff oneself, to fill ones belly |
| zik dan ber | karnını tika basa doldurmak | s'empiffrer | to stuff oneself |
| zikê xwe guvaştin (zikê xwe diguvêşe) | karnı zil çalmak | avoir une faim de loup, crever de faim | to be ravenous, starving |
| zipzurne | zil zurna | remonté | furious, livid |
| zik çêrandin | otlamak | être pique-assiette ou parasite | to be a sponger, a scrounger, or parasite |
| zimankin: zimankurt | dili kısa | redevable, qui a la langue courte | to owe s.b. s.thg, |
| zimanê yekî kin bûn | dili kısa olmak | se retenir de parler parce qu'on a qch. à se reprocher ou qu'on est redevable | to hold back from talking because one feels guilty or owes s.o. sthg |
| zimanê yekî birîn | sesini kesmek | faire taire qqn., clouer le bec à qqn | to silence s.o., to shut s.o up |
| zincîr qetandin | dizginleri koparmak | être déchaîné, sans retenue | to be furious, unrestrained |
| ziravqetandî (/qetyayî)bûn | ödü patlamak, ödü kopmak | avoir une peur bleue | to have a bad fright, to be in a blue funk |
| zirav rêşin | günden güne erimek | fondre jour après jour, maigrir | to melt away, to get thin |
| zivistan kirin kundir | kış karşılamaya hazır olmak | être fin prêt pour l'hiver | to be all ready for winter |

Ferhenga Avestayî-Kurdî

Beş 2

Bêhrûz ŞUCAÎ

| avestî | kurdî | tirkî | fransîzî | îngilîzî |
|-----------------------------------|------------------------------------|---------------------|---|---|
| pesev | pez | koyun | mouton | sheep |
| entere | hundir, hindir | iç, içeri | interne, intérieur | inner, interior |
| frezentey | ferzende | çocuk, oğul | enfant, fils | child, son |
| eyen | heyam | gün, gündüz | jour | day, daytime |
| avar | arî, alî, hawar | yardım | aide | help |
| erş-date | ... dat(in)- | iyi yapılmış | bien fait | well made, well built (things and people) |
| manah | ra(man), mane | anlam | signification | think, meaning |
| veçeh | bêj-, vaja, bêje | söylemek | dire | to say |
| zə me | zevî | toprak | terre | earth |
| uştire | huştir | deve | chameau | camel |
| ke | kê, kî, kîjan | hangi | qui | who, which |
| kete | key, ke(ke-banî) | oda | chambre | room, small house |
| meseh | mezin | büyük | grand | big |
| kede, keçe, ket | ke(ngê), key | olduğu zaman | quand | when |
| ken- | kend û kor | kazmak | creuser | to dig |
| keinye, keinî, keinîn | keynik, keç(ik), keynê | kız | filles | young girl, daughter |
| ker-, | kir-, -ki- | yapmak | faire | to do |
| kehrkase | kerkes | karga | vautour | vulture |
| kerət- | ker(i) kirin | kesmek | couper | to cut |
| keräte | kêr, kêrd | bıçak | couteau | knife, |
| kerəne | kerr | sağır | sourd | deaf |
| keirye | kar | iş, işlev | fonction | function |
| dûme | dûv | kuyruk | queue | tail |
| kerş, kerəşe | kêşan, kişandin | çekmek | tirer, porter | to draw, to carry |
| danev | dane, dene | tohum | graine | seed |
| kame | kam | arzu | désir | desire |
| zreya | zerya, derya | deniz | mer | sea, lake |
| kû | (li) kû | orada | où | where |
| kuda | kûda, kuda ? | nerede? | où ? | where? |
| kve | kude, kuve ? | nereye? | vers où ? | whither |
| gao | ga | öküz | bœuf | ox |
| daye | dayîn, dê | bakmak, ilgilenmek | prendre soin | taking care, (now mother) |
| gaona | gon, gûn | renk | couleur | colour |
| meêze | mîz | idrâr | urine | urine |
| zeste | dest | el | main | hand |
| geoş | guh, goş | kulak | oreille | ear |
| geoşvare | guhar | küpe | boucle d'oreille | ear-rings |
| gen-, cen-, cegn-, | jen- | vurmak | frapper, battre | to smite, to strike |
| gey, cigey, cve-, cvya | ji(iyîn), jîyan | yaşamak | vivre | to live |
| da- | da- | vermek | donner | to give |
| gaveiqye | gavan | çoban | bouvier | herd of cattle |
| gar | gewrî, gerû, | boğaz | gorge | throat, neck |
| gerey-, geiri | gir | tepe | colline | hill |
| gerəz-, gərəz-, gərəza, gərəzeête | gaz-, gazinde, gazinc | siten | complainte | a lament |
| gaça | gazî | şarkı | chant, hymne | song, hymn |
| gamen | gav | adım | pas | step, pace |
| gəne, gəne | jîn | kadın | femme | woman |
| xan-, xanye | kan, kanî | çeşme | source, fontaine | source, fountain, spring |
| xreos | xiroş | bağırmaq, korkutmak | crier, effrayer | to cry, to frighten |
| xrûnəra | xwîn- | kanlı | ensanglanté | bloody, blood soaked |
| xrûre | xwîn- | kana susamış | assoiffé de sang | blood-thirsty |
| puçre | pis | oğul | fils | son |
| xşeqre- | şah | şah | règne, souverain | reign, dominion, sovereign |
| xşeqrye | şahanî | şahane | royal | royal, kingly, |
| xşep | şev | gece | nuit | night |
| xşaye | şah | şah, kral | prince, roi | sovereign, king, prince |
| xşa(y) | şîyan, eşê, şe (kirin, weşe kirin) | yapabilmek | être capable de, maîtriser | to be able to, to master |
| xşnaoçre | xweşnûd | hoşnutluk | satisfaction | satisfaction |
| zan- | zanîn | bilmek | savoir | to know |
| xşveş | şeş | altı | six | six |
| zyam | (ziv)istan | kış | hiver | winter |
| çeçwer-, çetur- | çar, çwar, çiyar | dört | quatre | four |
| çeçru-kerene | çar-kenar | dört köşe | quatre coins | four corners |
| çenre-nhak- | çêre, çêr- | otlak | prairie | grazing |
| çarəmen | çerm | deri | peau | skin, leather |
| çiça | ceza, siza | ceza | punition | punishment, penalty |
| teoxmen | tov, toxim | tohum | graine | seed |
| tenû | ten | vücut | corps | body |
| tev-, tu-, tûtev, tûtu | twan-în | yapabilmek | être capable | to be able |
| terşne | tî, tenî | susamış | assoiffé | thirsty |
| teş- | teşe | biçim | forme | shape, form |
| teşte | teşt | tabak | assiette, coupe | dish, cup |
| tigrey, tigre | tîr | ok | flèche | arrow |
| tîjî | tîj, tûj | keskin | pointu, acéré | sharp |
| tvəm | tu, te | sen | tu | you, thee/thou (obsolete) |
| deêna | dîn | din | religion | religion |
| deêve- | dêw | şeytan | démon | false god, demon, fiend, devil |
| dag-, deje- | dax | yakmak | brûler | to burn |
| dedveh-, daduş- | da-ner | yaratıcı | créateur | creator |
| dar- | -dar | tutmak | tenir | to hold, maintain... |
| derəge | drêj | uzun | long | long |
| bazev | bask, bazk, (baz)bend | kol, kanat | bras, aile | arm |
| dese | des, deh | on | dix | ten |
| dese-gaye- | deh-gav | on adım | dix pas | (length of) ten paces |
| desəme | desem, dehem | onuncu | dixième | tenth |
| dehake | dehak | şeytani yaratık | être démoniaque | fiendish being |
| dehyev, dehyu- | dêh (niha gund), dih | toprak | terre | land |
| eje-y-dehake | ejdehak, ejderha | Dahak | Az-Dahak, roi démoniaque mythique d'Iran | Azhdehak, mythical fiendish king of Iran |
| da | dan(in) | yaratmak | créer | to create |

| | | | | |
|-----------------------------|----------------------------|----------------------------|---------------------------------------|--|
| day | daye, dê | 1) dadî; 2) özenle bakmak | 1) nounou ; 2) élever avec soin | 1) an child's nurse 2) to bring up (a child) carefully |
| day-, dîte- | dît-în | bakmak | voir, regarder | to see, to look at |
| date | dad, dat | doğru, kanun | droit, loi | right, law |
| data | dan, dran, didan | diş | dent | tooth |
| dauru | dar | ağaç | bois | wood |
| dvedese | donzde, dvedese | oniki | douze | twelve |
| qwe- | tu | sen | tu | you, thee/thou (obsolete) |
| grey | sê, hirê | üç | trois | three |
| greh-, tər əse-, | tirs | korku | peur, effroi, frayeur | fear, fright, dread |
| gri-sete | sê sed | üç yüz | trois cents | three hundred |
| zefen, zefeh- | dev | ağız | bouche | mouth |
| peêse | pîs | cüzzamlı | lépreux | leper |
| pek-, peçe | pat-, peht-, pêj- | pişirmek | cuire | to cook |
| pet-, pete-, peteye-, | peyt, pêt, pît | sıvışmak | sortir en vitesse, filer à l'anglaise | to rush (out), to take French leave |
| perştey | pirs | bilgi, soru | information, question | information, question |
| ped, pad, pede | pê | ayak | ped | foot, step |
| peçene | pehn, pan | geniş | large, spacieux | broad, wide, spacious |
| pençe | pênc | beş | cinq | five |
| pençe.dese | panzde | on beş | quinze | fifteen |
| pença-sent- | pêncî | elli | cinquante | fifty |
| perev, peuru, peouru- | pir | çok, birçok | nombreux, abondant, fréquent | many, abundant, often |
| pero | berî, pêr, par | önce | avant | before, foreword |
| peirî | berê, berî, par, pêr | önce, önceden | avant | before, formerly |
| pairî.deêze | parêz | ağıl | enclos | enclosure |
| perane, pərane | perr | tüy | plume | feather |
| perşta (from fras-) | pirs | sormak | demander | ask |
| parşte | parast-in | korunmak | protection, garde | cover, protection, wardship, guard |
| peşçe | paş | arka | derrière | behind |
| pezdeye | bizd-în | korkutmak | effrayer | to scare, to frighten, |
| pa(y)-, paye-, papey-, pah- | pa-yîn | beklemek | attendre, garder | to expect, to guard |
| paşne | pehnî, panî | topuk | talon | heel |
| pərətew | pird, pire, pir | köprü | pont | bridge |
| pərəgev | freh | geniş | large | wide, broad |
| einike | enî | alın | front | front |
| pərane | pirr, purr(di klasîkan de) | dolu | plein | full |
| pərəseiti | pirs-în | sormak | demander | ask |
| sare | ser, serî | baş, kafa | tête | head |
| pourucîre | pir-jîr | zekî | intelligent, doué | intelligent, gifted |
| mehrke- | merg | ölü | mort | dead |
| sete | sed | yüz | cent | hundred |
| hezenre- | hezar | bin | mille | thousand |
| pasto-, peste- | post, pîst | post | peau | skin, hairy skin |
| pişer, pişr-, | pî (dimilî) | baba | père | father |
| beod, beode-, baoda-, | bîhn, bihist(in) | fark etmek, kokusunu almak | sentir, percevoir | to perceive, to feel smell of |
| beodey (beod) | bîhn, bîn | koku | parfum | perfume, sweet scent |
| beodeh- | bihîst- | algılama | perception | perception, consciousness |
| bege | beg | malîk, tanrı | seigneur, Dieu | lord, god |
| bend-, bendeye-, beste- | bend-, best-in | bağlamak | relier, coller | to bind, glue |
| bu-, bv-, bûte | bû(n) | olimak | être | to be |
| ber-, bere-, bareye- | bir, bar | taşımak | porter | carry, bear |
| mahye- | meh | ay | mois | month |
| bûne | bin | alt | fond, dessous | bottom, underneath |
| espe | hesp | at | cheval | horse |
| sraogra, srûtey | sirûd | ezgi, dua | chant, prière | a chant, prayer |
| dûreş | dûr | uzak | loin, éloigné | far, far off, far away |
| fştane | bistan | kadın göğsü | poitrine de femme | woman's breast |
| ne | na, ne | değil | ne... pas | not |
| neê-çe | ne-jî | ve de | non plus | neither |
| neême- | nîv, nîm | yarı | moitié | half |
| neve- | neh, noh | dokuz | neuf | nine |
| nepat, nept, nepter, naptî | nevî, nebî | torun | petit-fils | grandson/daughter |
| neptye | nevîfî | zürîyet | descendant | descendant |
| neve | nû | yeni | nouveau, frais | new, fresh |
| nes-, nese, nase, naş | nêz, nêzîk | yaklaşmak, ulaşmak | approcher, atteindre | to approach, to come near, to reach |

Paşgirên kurdî

- I -

Amadekar : Reşo ZÎLAN

Paşgir, ango paşdanî yan jî paşpirtik, ew peyvên pir kurt in ku bi dawîya peyvên xwedîmane yê sade yan jî hevedudanî ve tîn girê dan û bi vî rengî maneyeke nû didin peyva ku nû hatîye afirandinê. Eger peyva berî paşgirê sade be, êdî ev peyva nûafirandî ya bi alîkarîya pirtikan dibe peyveke hevedudanî.

Heke em vê bi nimûneya peyva "tirsonêk" ve binimînin, em dibînin ku ev peyveke hevedudanî ye û ji du beşan pêk hatîye, "tirs" û "onêk". Beşa pêşîn, ku "tirs" e, xwedîmane ye. Peyveke ne hevedudanî ye, sade ye û em dizanin ku ew ji aliyê maneyê ve rewş û haletê ruhî nîşan dide. Beşa didwan ya vê peyvê "onêk" e, ku ne xwedîmane ye. Bi tena serê xwe hîç maneyekê nade. Lê gava ku ew bi beşa yekê ve tete girêdan, peyveke nû diafirîne, dibe "tirsonêk". Hingê peyva nûafirandî dibe peyveke hevedudanî. Ev peyva nûafirandî, çendî ji aliyê maneyê ve bi peyva pêşîn ve peywendîdar be jî, êdî xwedîmaneyeke nû ye û ji me re rewşa ruhî ya kesekî salox dide.

Di peyveke weha de, em ji vê beşa didwan, ku "onêk" e, paşgir dibêjin. Ev bi tena serê xwe ne xwedîmane ye û em bi misogerî nizanin ji çî peyvê hatîye û ketîye vî rengî. Li milekî din, paşgireke holê çu caran jî bi tena serê xwe nahête bi kar anîn. Ji ber vê yekê jî, divê bi dawîya peyvekê ve bête nûsandin (zeliqandin), ku jê maneyeke din diafirîne. Em vê rewşê di peyvên wek; zirtonek, bizdonek, fitlonek, zivronek / zîvronek û hwd de xweş dibînin.

Lê carina hin peyv hene ku em dizanin paşgira wan ji çî afirîne. Bo nimûne, peyva "masîgir", ango mirovê ku masîyan digire, bi karê girtina masîyan radibe. Em dibînin ku ev peyv ji beşên "masî" û "gir" hevedudanî ye. Beşa pêşîn, ku "masî" ye, navê malbateke heywanan e ku di avê de dijîn. Beşa didwan, ku "gir" e, di rewşêke bi tena

serê xwe de dikare jê sê maneyên jihevdir derkevin. Ya yekemîn, "gir" di maneya "girik, çiyakok, tepe, til" de ye. Ya didwan, di maneya "mezin" de ye. Heçî maneya sisyan e, ji lêkera "girtin"ê ye. Qurma wê ya dema niha ye; ez digirim, tu digirî, ew digire, em / hûn / ew digirin. Ne xwe, di peyva "masîgir" de, qet herdu maneyên pêşîn yê "gir"ê tune ye. Lê, maneya wê ya sisyan tê de heye. Li vir êdî ew perçeyek yan jî pirtikek e ji peyvekê. Ew wek pirtik, herçendî zû yan jî dereng peyva "girtin"ê bihîne bîra mirov jî, bi tena serê xwe ne xwedîmane ye. Bi tena serê xwe jî ne bi kar tê û ne jî têtê nivîsandin.

Di kurdî de, kîjan zarava dibe bila bibe, paşgirên heyî yan ji qurmên lêkeran yan jî ji parçeyên ku îro êdî bûne pirtik pêk tên. Piraniya van paşgiran bi tena serê xwe nahên bi kar anîn. Lê hindêk ji wan hene, ku îro di gel rola xwe ya paşgirê wek peyveke serbixwe jî têtê bi kar anîn; wek -kar, -bend, -xane û hwd. Di vê listeyê de me behsa çendek ji wan jî kiriye.

Di afirandina peyvên nû yê ji paşgiran hevedudanî de divê mirov berî her tiştî bala xwe bide nimûneyên ji berê de di zimanê kurdî de heyî. Li gor naveroka wê, xwe ji maneyên wê yê dîrokî bi dirê neêxe û bi vî awayî peyva nû li hev siwar bike.

Herçendî me ji bo peyva paşgirê, ku di zimanên ewropî de jê re *suffix* dibêjin, berê "paşdanî" gotibe jî, piştî gotûbêjêke dirê û dirêj, me baştir dît ku em di şûna wê de peyva *paşgir* bi kar binin. Di termînolojîya zimannasîyê de mefhûma paşgir çêtir mane dide û ji bo wergerandina mefhûmên din yê babetên cînar hêsaniyekê pêşkêş dide.

Em ê li vê jêrê listeyêke alfabetîk ya ji paşgirên di zaravayê kurmançî de heyî berpêş bikin û hewil bidin da ku bi kurtî rol û maneya wan ya fonksiyonel salox bidin.

-a (I) : Ev paşgir têtê dawîya hin qurmên lêkeran, yê dema niha yan jî borî, da ku merama ji lêkerê bide naveroka peyvê.
Nimûne: zana, beza, bîna, nebîna, fehma, xwenda, xura / xure (xwera / xwere)

-a (II) : Têtê dawîya hin rengdêran û wan dike navdêr.
Nimûne: germa, serma

-a (III) : Ji rengdêrekê rengdêreke nû diafirîne.
Nimûne: xama

-ahî / -ayî / -hî / -yî : Bi alîkarîya vê paşgirê navdêrên abstrakt tên çêkirin. Peyv eger bi tîpeke dengdar xelas be (-a)ya wê dikeve û dibe (-hî / -yî). Lê eger peyv bi tîpeke bêdeng dawî bêt, hingê (-a)ya vê paşgirê nakeve. Di devokên kurmançî de du formên vê paşgirê hene: 1. -ahî, 2. -ayî. Heçî kurdîya kurmançî ya nivîskî ye, rastnivîsa wê li ser bingeha klasîkên me, ku wê jî li ser bingeha devoka botî bejin daye, qanûnek daye ber xwe. Ji ber vê yekê ye, ku forma serekî ya vê paşgirê (-ahî) ye.
Nimûne: dûrahî, bilindahî, mezinahî, berahî, dirêjahî, germahî, bînahî, piçûkahî, sorahî, reşahî, zerahî, keskahî, hêşinahî, terahî, şilahî, kûrahî, avahî / avayî, şahî / yî, şenahî, şinahî, ronahî, korahî

-ajo : Paşgira ji lêkera "ajotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê ajotinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: kerajo, gaajo, dûajo

-ak : Ji rengdêrekê rengdêreke nû diafirîne.
Nimûne: ronak,

-al : Bi alîkarîya vê paşgirê navdêr têtê çêkirin.
Nimûne: heval, kortal, tengal, kendal

-alês : Paşgira ji lêkera "alastin, alistin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê alastinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: qûnalês, solalês, kodâlês, kasalês (kasealês), firaqalês

-an /-yan (I) : Nîşana piraniyê ye. Piraniya forma nebinavkirî ye û têtê dawîya navdêrên hem mê û hem jî nêr.
Nimûne: kofîya jinan, kumê mêran, erdê gundîyan, welatê kurdan

-an /-yan (II) : Wek nîşana piraniyê navê el û eşîretê dide xuya kirin.
Nimûne: heyderan, demenan, kikan, milan, reşkotan, celalîyan, gawestîyan, Goyîyan

-an /-yan (III) : Navê herêmekê ku el û eşîreta navkirî lê dijî yan jî lê dima nîşan dide.
Nimûne: Botan, Soran, Mukrîyan, Behdînan

-an /-yan (IV) : Wek nîşana piraniyê ji navdêran navdêreke nû û xwedan maneyêke nû diafirîne.
Nimûne: gulan, xalan, apan

-ane (I) : Paşgirek e ku pê hoker têtê çêkirin û maneya "bi awayê, bi rengê, bi tehrê, bi şiklê" dide peyvê.
Nimûne: kurdane, serxweşane, mîrane, dostane, şêrane, mêrane, yekane, tekane, jinane, sextekarane, şahane, merdane

-ane (II) : Hoker dem û zemanan çêdike û maneya "her..., wek her..., " dide peyva ku ew pê ve têtê girêdanê.
Nimûne: rojane, mehane / heyvane, heftane, salane,

-ane / (III) : Bi alîkarîya vê pirtikê hoker yan jî navdêr tên çêkirin.
Nimûne: yekane, perane, tekane

-anê / -anî : Bi alîkarîya vê pirtikê navên listik û yariyan tên çêkirin.
Nimûne: topanê (talanê), goganê / goganî, kêlanê / kêlanî, bersinganê, çoganê, hêlanê, beranê

-anî (I) : Bi alîkarîya vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji rengdêran navdêrên abstrakt tên çêkirin.
Nimûne: piranî, mêranî, xortanî, koranî, kêmanî, keçanî, qîzanî, jinanî

-anî (II) : Bi alîkarîya vê paşgirê navên hin xwarinan û hwd tên çêkirin.
Nimûne: boranî, çortanî, şiranî, doşanî

-anok : Bi alîkarîya vê paşgirê navdêr tên çêkirin.
Nimûne: tiştanok, çivanok

-ar (I) : Ji bo çêkirina navê tiştêkî bi kar tê.
Nimûne: destar, guhar

-ar (II) : Têtê dawîya peyvên ji qurma lêkeran afirî û heysê û rengêkî dide gotinê. Heye ku ji kurtbûna paşgira "-dar" be.
Nimûne: nivîsar, gotar, didar, reftar, kuştar, kirdar, mirar

-ar (III) : Ji bo çêkirina navê kesê ku karekî dike û pê radibe" têtê bi kar anîn. Heye ku ji kurtbûna paşgira "-yar" be.
Nimûne: cotar / cotyar, xewar, mirar, kirar

-ar (IV) : Ji rengdêran rengdêreke nû çêdike.
Nimûne: kevnar, jengar / jingar / zengar / zingar

-ar (VI) : Ji hokeran hokereke nû diafirîne.
Nimûne: pêrar

-are (I) : Ji rengdêran rengdêreke nû çêdike.
Nimûne: kevnare

- are (II)** : Ev paşgir bi maneya "xemilandî, bi xemil" de ye.
Nimûne: dilare
- asa** : Bi maneya "wek, mîna, fena, mînanî, şitî, şubhê" de hokeran çêdike.
Nimûne: dêwasa, hûtasa
- asî** : Ji rengdêr yan jî ji navekî navdêreke abstrakt çêdike. Heye ku ev pirtik ji guhirîna "-asa" ya bi maneya "wek, mîna, fena, mînanî, şitî, şubhê" de be.
Nimûne: kêmasî, kurtasî, kurdasî
- atî /-yatî** : Bi alîkarîya vê paşgirê navdêrên abstrakt tên çêkirin.
Nimûne: kirîvatî, êzdiyatî, mirovatî, xizmatî
- avêj** : Paşgira ji lêkera "avêtin, havêjtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê avêtinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: topavêj, bombeavêj, tîravêj, dûravêj, gûavêj
- avî** : Di zaravayê kurmançî de peyva "avî" bi tena serê xwe xwedîmane ye, maneyeke taybetî dide. Ev peyv jî bo tiştê "avdar, bi av û herikok" tete gotin. Bo nimûne: sêveke avî, xwarineke avî, erdê avî, avî û dêmî. Lê, herwekî di van çend nimûneyên jêrin de xuya dibe, peyva "avî" jî vê maneyê piçekî dîr e. Ew êdî bi rola paş girîyê radibe. Bi alîkarîya vê paşgirê jî navdêreke hokerek tete çêkirin.
Nimûne: ewravî, çiravî, giravî, qiravî
- wî / -yî** : Ji vê paşgirê navê hin nexweşîyan tete çêkirin.
Nimûne: tawî, bawî
- awer** : Paşgira ji lêkera "awerden" a farisî û "awirden, hawirden" a kurdîya jêrin e, ango "anîn, hanîn, înan, hînan". Lê wek paş gir ji maneya bingehîn ya lêkerê bi dîr ketîye, bûye xwedî maneyeke duhemîn, ku ew jî maneya "xwedîbûn, tedehebûn"ê ye.
Nimûne: cengawer, dilawer
- wend** : Xudawend
- ayetî** : Ev paşgir di van çend dehsalên dawîn de ji zaravayê soranî ketîye kurmançî. Bi alîkarîya vê paşgirê navdêrên abstrakt tên çêkirin.
Nimûne: kurdayetî, birayetî
- bar (I)** : Ev paşgir bi maneya "destûr heye ku bikî, dikare bête kirin, qabilî kirinê" ye.
Nimûne: guhêrbar, guhêzbar, birbar, dîtbar / dîbar, nedîbar, xwarbar
- bar (II)** : Ev ji lêkera "barîn"ê afirîye û wek paş gir bi maneya "tijî (bi), dagirtî (bi)" de ye.
Nimûne: gunehbar, tawanbar, xembar, çavnebar, zîyanbar, xetabar
- bar (III)** : Ev paş gir ji zimanê pehlewî hatîye û bi maneya "perav, qirax, kenar, rêya avê" ye.
Nimûne: rûbar, cobar, zêbar
- bare** : Bi maneya "car"ê de ye.
Nimûne: dubare, sêbare
- baz (I)** : Paşgira ji lêkera "bazdan"ê, ango "lîstin"ê ye. Di kurmançîya bo nimûne Berazîyan û ya hêla Ruhayê de, ji bo lîstina bi maneya "dîl kirin û reqs"ê de, dibêjin "bazdan". Ji ber vê yekê, gava ku ev paşgir tete dawîya peyvekê, maneya "kesê ku bi karê lîstinê radibe" dide peyvê. Peywendîya vê lêkerê bi "bazdan" a ku bi maneya "revîn, xwe nedan dest, xwe hilavêtin, xwe çeng kirin, hop kirin û hwd"ê tune ye.
Nimûne: fêlbaz, qumarbaz, canbaz, kindirbaz, serbaz, şûrbaz, rimbaz, jinbaz, kiçbaz, dilbaz, sêhrbaz, hîlebaz, hoqebaz, dekbaz, tewlebaz (fêlbaz), çenebaz
- baz (II)** : Ji lêkera "bazdan"ê ku peywendîya wê bi "çûn"ê heye.
Nimûne: derbaz, , rêbaz
- bêj** : Paşgira ji lêkera "gotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê gotinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: dengbêj, stranbêj, çirokbêj, henekbêj, xweşbêj (xoşbêş), gotûbêj, gotinbêj, Pîrbêj, ezberbêj
- bend (I)** : Paşgira ji lêkera "bestin"ê, ango "girêdan"ê de ye.
Nimûne: bazbend, derbend, girêbend, çiçikbend, terkîbend, destbend, dolbend, rûbend
- bend (II)** : Bi maneya "girêdan û bestin"ê de kar û pêşeyekê nîşan dide.
Nimûne: solbend, nalbend
- bend (III)** : Bi maneya "xwe bi tiştê ve girêdayî dîtin"ê dide.
Nimûne: sazband, hevalband
- ber (I)** : Paşgira ji lêkera "burden" a farisî û "birin" a kurdî ye ku maneya "kesê / tiştê ku bi karê birinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: rêber, dilber, rêveber, emirber, nameber, fermanber, penaber, pêxamber / pêxember / peyamber, ajneber
- ber (II)** : Bi maneya "hebûn"ê de ye.
Nimûne: sîber, ruhber
- best** : Paşgira ji lêkera "bestin"ê, ango "girêdan"ê ye ku maneya "kesê / tiştê ku bi karê girêdanê radibe dide peyvê.
Nimûne: darbest, serbest, benbest, helbest
- bir** : Paşgira ji lêkera "birin"ê ye û maneya "kesê/tiştê ku bi karê birinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: barbir, avrûbir, zorbir, bîrbir
- birr** : Paşgira ji lêkera "birrîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê birrînê radibe" dide peyvê.
Nimûne: darbirr, rêbirr, cawbirr, çolbirr, avbirr, serbirr, navbirr, kurtebirr, qutbirr, destbirr, dewbirr (yê ku pezê xwe liserhev difroşe), tabirr, çilbirr (yê ku çilê zarokan dibire), şikêlbirr (nexweşîya zarokan e û heta dibin 3-4 salî nikarin bimeşin. Yê ku şikêlê dibirre), mehrbirr, cobirr
- bihêrk / -buhêrk /-bêrk** : Paşgira ji lêkera "bihartin / buhartin"ê ye û maneya "tiştê ku bi karê bihartinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: şevbihêrk, rêbuhêrk, dilbuhêrk
- bîn** : Paşgira ji lêkera "dîtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê dîtinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: dûrbîn /dûrebîn, bedbîn, hûrbîn, xweşbîn, nebîn, geşbîn, rastbîn
- ç** : Paşgira ji bo piçûkkirinê ye û kurtbûyîya "çe"yê ye.
Nimûne: rêç, riç (rîçal, reh û rîçal)
- çe** : Paşgira ji bo piçûkkirinê ye.
Nimûne: alûçe, baxçe, parçe, boxçe, nîvçe (nîvcî, nîvco), kemaçe, xaliçe, nalçe
- çik** : Paşgira ji bo piçûkkirinê ye. Ji du pirtikên piçûkkirinê, ji "ç" û "ik"ê pêk hatîye.
Nimûne: rûçik, rêçik
- çin** : Paşgira ji lêkera "çinîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê çinînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: mazîçin, gulçin, pembûçin, titûnçin

-çing: Paş girek e, ku ji pirtika "çin"ya ya ji lêkera "çinîn"ê û pirtika "g"yê, ku ji paş gira "ing" a ji bo piçûkkirinê ye, pêk hatîye. Bi vê paş girê navên alavan tête çêkirin.
Nimûne: mûçing

-çîn: Paşgira ji lêkera "çandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê çandinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: derewçîn, gulçîn

-çolkî: Ji rengdêrekê hokerê diafirîne.
Nimûne: spiçolkî

-da: Paşgira ji lêkera "dan / dayîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê dayînê radibe" dide peyvê.
Nimûne: nanda / nande, xwedêda

-dan (I): Derdana tiştêkî nişan dide.
Nimûne: derdan, şimadan, mûmdan, agirdan, çaydan, guldan, kildan,

-dank: Derdaneke piçûk ya tiştêkî nişan dide. Paş gireke hevedudanî ye û ji peyva "dan" û pirtika piçûkkirinê ya "k"yê pêk hatîye.
Nimûne: agirdank, avdank, avildank, çaydank, derdank, derzîdank, gulçîdank, kevçîdank, kildank, mîzdank, mûmdank, pîfdank, pîzdank, şekirdank, şimadank, xwêdank, xwelîdank

-dar /-(e)dar (I): Paşgira ji lêkera "daştin" a farisî ye ku di hin zaravayên kurdî de "darîn" e û hevmaneya lêkera "hebûn"ê ye. Paş gira "dar" bi maneya "heye / heyî"yê de ye.
Nimûne: agahdar, ahengdar, avdar, bêhndar, birîndar, çekdar, cindar, dêndar, derdedar, deyndar, dikandar, dîndar, evîndar, fermanदार, kirdar, kirêdar, maldar, mêvandar, nandar, nedar, payedar, piştedar / piştîdar, remildar, serdar, sermayedar, xwîndar, zordar,

-dar (II): Di zaravayê kurmançî de bi tenê di peyva "guhdar" de, ku bi awayekî ş aş , paş gira "dar" di maneya "dan / dayîn"ê de ye. Rastîya vê, herwekî di klasîkên me de ji derbas dibe, "dêr" e û ji lêkera "dêrîn / dêran"ê ye. Di klasîkan nivîskî de ev wek "guh bidêre" ye û peyva "guhdar" jî di edebîyata devkî de "guhder" e.
Nimûne: guhdar / guhder

-de: Paşgira ji lêkera "dan / dayîn"ê ye û maneya "dayîn"ê dide peyvê.
Nimûne: nande (nanda, nandar), dîyarde, qûnde

-dek: Navên alav û hacetekê nişan dide.
Nimûne: badek, nişandek

-der /-eder (I): Ev paşgir maneya "derve" dide peyvê.
Nimûne: şevder / şeveder, çavder (çavlider), dader

-der (II): Paşgira ji lêkera "dan / dayîn"ê ye û maneya "dayîn"ê dide peyvê.
Nimûne: fermander

-derz: Paşgira ji lêkera "dirûn, dirûtin"ê ye û maneya "kesê ku bi karê dirûtinê radibe" dide peyvê. Peyva "derzî" û "terzî" jî her ji vê peyvê hatine.
Nimûne: qûnderz (cureyek kêlê / dirûtinê ye), duderz

-dêr: Paşgira ji lêkera "dêran / dêrîn"ê ye û maneya dayînê dide peyvê. Li „-dar (II)"an binihêre.
Nimûne: avdêr, guhdêr, çavdêr, kardêr, kirêdêr

-dêrî / -dorî: Paşgireke hevedudanî ye û ji "dêr" a ji lêkera "dêran / dêrîn"ê, ku bi maneya "dan / dayîn"ê ye, û ji pirtika "î"yê pêk hatîye. Navdêreken abstrakt diafirîne.
Nimûne: gadêrî / gadorî, şevdêrî / şevdorî

-dirû: Paşgira ji lêkera "dirûn, dirûtin"ê ye û maneya "kesê ku bi karê dirûtinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: soldirû, kurtandirû, cildirû (kinçdirû)

-dîn: Bi maneya "cih, sitar"ê de ye.
Nimûne: kadîn, gîyadîn

-doş: Paşgira ji lêkera "dotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê dotinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: çêlekdoş, pezdosh, kerdoş

-doz / -diz (I): Paşgira ji lêkera "dirûn, dirûtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê dirûtinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: pînedoz / pînediz, çewaldoz / çewaldiz,

-doz (II): Paşgira ji lêkera "dozîn, doz kirin"ê ye û maneya "kesê ku bi karê peydakirin û bidestxistinê radibe" dide peyvê. Di zaravayê soranî de ev lêker bi tenê bi maneya "peydakirin"ê de ye û gelekî berfirehtir tête bi kar anîn. Lê di kurmançî de, "doz kirin" bi maneya "da'we kirin, xwastin"ê de ye. Lê, bi maneya "peydakirin"ê de, bi tenê di kurmançîya li hêla Depê / Xarpêtê de tête bi kar anîn.
Nimûne: nandoz, wardoz

-e (I): Tête dawîya peyvên ji qurma lêkeran afirî û heysê û rengê dide gotinê.
Nimûne: bijarte, bijare, bêje, jimare, bende, kêşe, beste, hinare, şikeste, kirde, xwende, male, awarte

-e (II): Tête dawîya peyvên ku rengan nişan dide û maneya "rengê ku ber bi wî rengî diçe, rengê ku dişibe wî rengî" dide peyvê.
Nimûne: sore, keske, zere, gewre

-e (III): Tête dawîya hin peyvên ku peywendîya wan di gel zeman heye yan jî zeman nişan didin û maneya "bi wê demê ve girêdayî, di wan wextan de" dide peyvê.
Nimûne: bihare, êvare, payîze, sere, navsere, hefte, çile (çele)

-e (IV): Ji peyvên navdêr yan jî rengdêr navdêreke nû û xwedan maneyeke nû û taybetî diafirîne.
Nimûne: deste, dermale, çilmêre, şewate, sebze, kore, nerme

-ek (I): Gelek caran navên tiştan, nemaze navên hacet û alavan diafirîne.
Nimûne: destek, badek, rastek, piştêk, birrek, xizek, nîvek, şeşek, heştêk, heftêk, fitlek, xwastek, kotek, xurek (xwarek / xwerek)

-ek (II): Navên ku xuy û xeyseteke taybetî dide mirovan diafirîne.
Nimûne: virrek, serek, kulek, silek, çilek, zirtek, fisek, tirrek, tirsek, mîrek, pîrek, wêrek, newêrek, fenek, parsek, kulek

-el: Ev paşgir maneya "bi rengê" dide peyvê û wê dike xwedan xeyseta navdayî û jê rengdêrekê diafirîne.
Nimûne: çepel, komel